Ji bilî zimanê farisî û ´erebî navbirî xwe hînî zimanê Turkî jî kirye ji ber hez jê kirina wî bo seydayê hêja seydaê xwe (Mela Se´îd Norsî) û nameyên wî, Dema boye yek ji xwendkarên wî, Ji bo vê rêzgirtinê hemî berhemê Norsî ewê bi zimanê turkî hatîye nivîsandin belav kirin ji boy şoşî hatîye şan din û li xwe cemandîne û heya roja îrojî di pertukxaneya wî dene, li vêre Şoşî bo êkem car li îraqê namek li ser jîyana norsî wergerandîye ser zimanê ´erebî hatîye çap kirin.

Her bo wê çendê hozanvanê me şîyanên xwe aşkere biket hozanek bi şêwezarê soranî raçandîye di pesin û medheya xaneqaya Şêx Mistefa yê hewlêrê dedi dema di xwendigeha wê xaneqay de dixwend li sala(1943)zayînî. Lê cihê daxêye ev parçehozane nîvek jê berze bo ye b tenê perek jê maye li sernivîsaye (xezelêk le medîhey xaneqay Şêx Mistefay hewlêrî)tê de weha daye xweya kirin:

***Temam waye xem û xoslî rehakem*** ***sîfatî xaneqay Şêx Mistefa kem***

***´Ecaîb mewqî´î ke dil goşade*** ***weku baxî îrem xoş xak û bade***

***Le rox şare nenêw şare pir xirore*** ***kesî dîn meqsedî bê bê qosore***

***Heqîqet rewdeye îkî pir neqawe*** ***muselsel awî wek firmêskî çawe***

***Le her ca pirteqal westan moqabil*** ***gilopî kehrebane ya hewqane dil***(hemze Şoşî;2017:34).

Wataya wê anku: Ev xaneqe ye zora ciwane, Pêdvîye pesna vê cihî pîroz bihê kirin ku:Gelek dîmenên dilveker û xweş lê hene, Di kevîte rex şarê nav bazar de û her kesê qesta vê cihê bike mebesta xwe lê dibnît, Li çwar alîyên wê darên pirteqala di belavin û berhemê wan mina gilopan di birîsqin.

### 2.4.3. Nivîsandina Hozanên Wî Hunera Wî ya Destî

Hozanên wî li ser serwa Şira kilasîkî di hatine vehandin di bîyavê hozan kilasîk de gelke xwe nêzîkî hozanvanê mezin(Şêx Ahemdê Cizîrî)kirîye û çiwar hozanên wê texmîs kirîne li dumahîya dîwana cizîrî ewa bi destê xo nivîsî tehqîq kirî.(Muhsin Duskî.1989;73). Helbet dema ku me ev yek nvîsandî xweya bo ku hozanvanê me bi serwya şira kilask zal boye li ser şêweyê mem û zînê nivîsan dine.

Şoşî mîna tef hozanvanên kevin û her bi wê inyeta Şêx û mela hizir pêkirî, her bi wan peyv û zaravên evînî û ´eşiqê, bi hiizr û xeyal û remzên hez jêkieina xwedê û pêxembera(s)vîyana xwe dîyar kiîye çunkî bi kar anîna remzên hez jê kirinê ristên pir wata, anku peyva ne aşkera xeyala mirovê dwîr di bet û bilind id frît xweşî û tameka dî dide te peyvê.edî bara pirta hozana kevin der birînê ji eşqa îlahî dikin, çunkî hozanvanên meyên kevin tev da şêx û mela û zana bo ne weke Cizîrî Xanî Feqê Teyra Alî Herîrî Birîfkî, Şêx Tahir jî yek i wan mirovên teqawa dar û xwedê nîyas boye, lewra dema ku hozanvanî ev rengî hozanê vehandî tenê em di em di karîn vê ravekirnê bi deynê ku her pesnek û risteka evînîyê tê de hat bîtin bi vîyana xwedê bîr û bawerên aynê proz vehandî ye.(Hemze Şoşî,2017;11-12).

Şêx Tahirî weke hemu hozanû mela û zanyan li ser ayînê pêrozê îslamê hel hatîte hozanên xwe bara pitir li naveroka wan de pir alyê ayînî lis er zal bo ye lewar wî hemî ruh û canê xwe di derbarê ayînê pêrozê îslamê û xebata xwe ya birye serî.

Mênakek ji parçe hozana texmîsa wî:

Parçek ji hozana ***(Ez nizanim sebebê yarê Çira du rê kirîn)***

***Dilber min du mojganê xo menqorê kirîn bê xeta kirme şehîdê xo di xwînê sor kirîn***

***Şibhî bilbil bi lepê xonçe te mecborê kirîn ez nizanim sebebê yarê çira du rê kirîn.***( Muhsin Duskî.1989;73).

### 2.4.4. Hunerên Wî

Honerê şira fêrkirnê û pesin û pê da gotin û çîrok û xezel jî hene, Hozana fêrkirinê ev Şêwê hozanê di çaxên kevin da yê ber ber belav bo ye zanyaên berê zanist û nivîsînên xwe bi şêwê hozana kurt kirîne ûvehaîye heta ku xwendevan bi sanehî ji ber biket û tê bigehît, hin caran jî feweyan ev hozane bi selîqe dobare dikirin û dengê xwe pê bilind di kir, heta dengê wan li dwîr dihat bihîstnê nexasime li şarên mezin evca Şoşî jî bu ûkem car ev dergehe qotaye û qesta mêrgên gundê(Nodihê)kirye da kurtîya pertuka (Şêx Merof Nodhî) di warê `Erozê da ewa bi zimanê `Erebî vehandî û Şlove biket ev vehînoke dîsa şoşî bi zimanê ´Erebî şilove kir ye ku jimara wan (535)malkin.(Hemze Şoşî,2017;6).

Şoşî babtekê code bi navê(Fen Elqafîye)li ser zê de kirye bi heman kêş û şêwe, ku jimara malkên wê(98)beytin hejî gotinê ye ku hetanoke ev namîlke nehatîye çapkirin,ku bi awayekî ekadimîe hêjaye bihête tehqîq kirin bi şêwekê eka dimîkweke di li pêşî yê de di bêjît:“Şerih menzom ´Ela ercozet el-Şêx me´rof el-nudhî fî ´alem el-´rod welyet nzim el-qafîye linizamihim homa Muhemed Tahir bin eî-Şix Muhmed el-Şoşî xefere allah lehuma.” (Destxet).

Xweyaye Herwesa di honerên din de Şoşî bi awayek ciwan û balkêş endazey honera xwe di de dîyar kirin çi bi awayê xweş nivîsîyê de çi di alîyê.

## 2.5. Jîyannameya Şêx Tahirê Şoşî

Berî xwe dahêlîn jîne nîgara Şêx Tahirî fere ku bizanîn milletê Kurd weke her milletek din xwedî kultur û çand û ziman û edebîatek taybet boye zana û hozanvan û helbestvanên mezin di navda rabone, evca di nava bakur yan başor yan rojhelat yan rojava nav û dengîya xwe vedaye, Ev kesayetî em behis dikin keseyatîyek li başurê Kurdistana iraqê ye jîyana xwe birê da birîye jibo xizmeta çanda Kurdî û edebîyatê bi taybet, helbet devera behdînan yeke ji kevanartirîn deverên mîrnişînên cîhanê,Lewra gelek keseyetî û navdar li nava Kurdan rabon û hebona wan maye li dine de, Evca çi bi hozan çîrok yan roman rojnamegerî di her tiştîde zengîn boye, Hewrweha devera badînan bi taybet gundê Şoşê rolek giring û ber çav û dîyar heboye di layenê rewşwnbîrî

de(Hemze Şoşî,2017;14). Çunkî gundê Şoşê ew gunde yê ku Şêx Tahir Şoşî lê ji dayîk bûy ku çendîn zana û niviskar rewşenbîr lê jîyayne, Ji berku nivîser û hozanvan di bine nwîner û hêma bû ser dem û mêjoya milletê xwe em wesa di bînîn ku Şoşî jî êk ji wan nwînera û hêmaya ye di serdemê xweda di nava millet da, ji berku rolekê giring û berçav di bwarê edebîyat dîndarî û hozan û xetxoşî rewşenbîryê de gêraye, Lewma kesanên mînakî wî pêtvî bi lêkolîn û dîf çuna berhemên wîye,Ji ber wêyekê emê jîn û jîr û xet xoşîya vî zanay bi din ber çav kirin.

### 2.5.1. Navê Wî yê Rasteqîn

Xweyaye ku pitirîya hozanvan û helbestvana û edebîyatnasên di qada edebî de kar dikin her yek ji wan nav û nasnaveyên co da hene, Ev nav û nasnav wan didin nasîn naskirin hind ji wan bi wan navan meşhorin hin jî bi navên xwe ên resmî, “Navê wî yê rasteqîne Tahire kurê Muhemed Kurê Tahirî kurê Şêx Islamê kurê Abduurehaman Kurê Abdullahy ê Kurê Şêx Yunis Kurê Şêx Abduurahmanê Şoşî ye”(Hemze Tahir Şoşî, 2012; 18).

Herweha di ciheke dinda ku Şêx Tahirî bi xwe jîyana xwe nivîsandîye bi tîpên erebî weha di bîje:“Ez eve heşt mehe dinava nexweşxaneya (Tuwîse)nivandîm.Tahir kurê muhemed kurê tahirê şêx besulmana yê şoşî ebasî, Binemala me di gehîte fedlê kurê ebasê kurê abdullmotelîb mamê pêxemberî silavên xwedê li ser roha hemîya”(Sadiq Bihaedîn Amêdî, 1980; 507).

Di vir de Şêx nexweş ketîye ku nexweşîyek giran lê peyda di be lewra maweyek dirêj di nexweşxaneyê de di mîne ew bi xwe jîne ngara xwe di nvîse ji bu ku xebata wî li ber çavê xwendkar û nivîskaran de bi mêne û xebata wî ber bi av da neçe. Şêx mirovek heş xwe ker bo ye berdewam pak û paqij boye cilên melayan li ber xwe dikirin ku mina zana dihat pêşçav bi rengê sipî xwe di pêça.

Binemala şoşî wiha di de xweya kirin ku “Binemala Şoşê di gehîte bapîrê meyê mezin Şêx Şemsedîn kurê Şêx Izedînê Şoşî” (Zardev).

### 2.5.2. Binemala Şoşî

Ji binemala şêx şemsedînê kurê şêx ezedînê qotbe, ewê jîyay di navbera çerxê nehê û dehê kuçî de, anku ji berî (400)sala, Ku binemala wan di gehîte (Fedlê Kurê Ebasî) Mamê Pêxemberî (Silavêt Xwedê Lê Bin) Dema îşaret pê day di pirtûka jîyanameya xwe de ku wî bi vî away nivîsî ye anku li vir Şoşî nekarye vê zincîreya he bi gehînte îk neşîyaye vê gotinê msoger bikket lewra emjî nikarîn vê zincîrê jê veqetînîn jêk coda bikeyîn lerwa encama herî dawî ku me deqa nivîsîna wî weke xwe înayexwarê.(Hemze Tahir Şoşî, 2012; 18-19).

Binamala wan di layenê dînî û rewşenbîrî de herî zêde di perwedeya xwandin rewşenbîrîyetê de bûn, Bi dehan zana û mela şêx derkeftîne fenera zanînê û meşxela rewşenbîryê li wê deverê herdem li zanist û zanînê geşkirîye tekîya wê b navê(terîqa xilwetê)avedankirîye herdem feqî ş mirîdên dînî li wê tekyayê ve hewandine.

Şoşî bhsê binemala xwe kirîye û di bîjît : “Bnemala Me Noke Nêzîkî Bîst Mala ye hemî li gundê Şoşê de ne tenê malek nebît li devera mizorîyan akincîye” (Sadiq Bihaedîn Amêdî, 1980; 508).

Helbet xweyaye Şoşî jibinemalek Kurd perwer xwedê nas û dînar bû ye, Lê di nuke de ev binemale bi awayek berçav di ber fireh bonê de ye li duhok û akrê herdîsan çend malek li bakur jîyana xwe di bin serî.

### 2.5.3. Jidayîkbona Wî

Di pirtûka jîyanameya xweda ku me ameje pêkir wî di nexweşxaneyê de nivîsandîye ew bi xwe îşaretê di det ku “Li Sala1336k-1917-1918z, Li sala kulip û xelayê ku dîmahîka cengê cihanîyê êkê bû ji dayîk bûye, Li gund Şoşê yê ku bi kela kevnar navdar li rojavayê Qeza Akrê” (Sadiq Bihaedîn Amêdî, 1980; 508).

Ev sala ji dayîk bîna wî wî bi xwe nivîsaye bi dest xetê xwe, Şoşê gundeke di navbera bajarê duhokê û qeza akrê de ku gund di kevîte bin zincîra çîyayên akrê li rojavay bi duratîya (20)km, Di navbera gundê (Şerminê) û (Gundikî)De ye, Ev dever darîye ya ber niyase bi Berbinê ser bi eşîreta zêbarîyan ve, Tahir şoşî di nava dîmenên

ciwanên siroştê gundê Şoşê dinava çîya û mêrgo rez û kanîyan çavên xwe li dunyayê vekirine.(Ahmed Salih, 2005, 23).

### 2.5.4. Jîyana Şêxî Çawan Derbaz Bûye

Şoşî di malbatek dîndar û xwedê nas û rewşenbîr ku bapîrên wî tev şîx û zana mela û hozanvan bîne, perwerde bûye çavên xwe li gindê Şoşê vekirîye di nava vê malbatî de, Ew bi xwe di pirtûka xweda di bîje “Di zarukatîya xwe de min qoran li cem babê xwe xiwandî ye, Piştî qoranê min pirtûka (Almuherer) Di fiqhê şafiîde li nik hindek mirovîn xwe xiwandî ye, Ji wan mirovan Memduh Kurê Abdulwehabî Kurê Abdulqadirî Xiwandî ye, Belê mixabin her zode mir min gelek jê ndeît çunkî ez hêj zark bûm, Lê belê ez hêj li ser xiwandin rijd bom û li ser xwandinaxwe berdewam bûm, gelek axayan zordarî li mekirin wekê abdulqadir axa kurê osman axay lewra ji Şoşê çuyne gundê(Omer Xoşan) Li alîyê jêrî yê akrê,digel xalê min hacî tewfîq û yasînê kurê mehmudî ji malabata me Pazde salan burandin”(Sadiq Biaedîn Amêdî,1980; 509).

Di virde dîyar dibe ku wî bi awayekî herî rijd hezaxwandin û nivîsandinê hebîye û berdewam li xwandinê geryaye ku hêj ew zarok hînî herfên erebî bûye li cem babî xwe ji berku nivîsan din û xwandina wê serdemê bi erebî bûye, Herweha ji ber ku di wê serdêde axa û derebeg hebûyne lewra ji ber zilm û sitema wan axayan dema ku axa gund di çin ji wir maweyek di mînîn ew jîyana xwe li wir di bin serî.

“Pêşnivêj û gotar xiwandin û wenebêjî nivîsandina pirtukan kareke mezin kirye û şarezayîyek mezin di gelek defetanda hebo, nivîskarek zîrek bû muleta wergirtêna jialîyê (Muhemed Tahir ElKurdî Elmelikî)bi nivîsandina xweya ciwan anku xet xweşî înaye bi xeta nivîsana xwe gelek name û pirtuk nivîsandine ji bû Şêxê xwe bediî zeman” (Hemdî Selefî, Tesîn Duskî, 2008; 252). Ji ber ku mirovek ew qas dîn dar bûye lewra ew berdewam li zanist û zanînê di gerît.

“Şoşî bingehekê dînî yê navdar bo pişikdarî yekbaş di kulturê dînê de heye. Yek ji wan kesên ku bi zimanê Kurdî pişikdarî di evî bingehî de kirî Şêx Tahir bû ye” (Fadil Omer, 2005; 29). Di vê yekê de bû me dîyar di be ku ew pitir di alîyê dîn û dîndarî de û vîyana xweday û pêxemberê wî karî gerbûye.

Şoşî her di zarokîtîya xwede beref xwadin û zanînê çuye lewra li ser vê şopê berdewam bûye. “Ewî bi dû karên sreke jîyane xwe di bire serî ya yekem: berdewamî dan bi zengîn kirina wê gencîn û kelturê zanîn û rewişta ewa ji bapîrên xwe wergirtî, lewra Xudê jê razî jîyana hemî jîyana xwe terxankir ye ji bo wergirtina zanînê, berdewam bi geşt û geryananve bû yeji bû zengîn kirina rewşenbîrîya xwe, ku şev û rojên xwe di kirin êk ji bo ku xwedayê xwe ji xwe razî bi ket û li beramber wî serferaz bît li dunya û roja hesabî de serferaz bît, nevîyaye bi mînît darek hişik bê berhem û kes mifa jê ne wergirît, Ya duyem: Ne qebîl kirin û berhengarîya wî bû zilm û sitemê ku hemî wexta pişgîrî hejaran bo ye mafên wan parastîne, Ta ku ji bindestî yê rizgar bi bin, gelek dijî zaliman westîyaye û rolekê bi hêz hebîye di paldan wan bû vegerandna wê seng û plu payeya wî xaliqê mezin bi tev mirovan day” (Hemze Tahir Şoşî, 2012; 21).

Dîyar dibe ku Şoşî Hemî xem û hizra wî ew bûye ku zanist û zanînî li cem xwe kum biket û vê zanînê bikar bînît ji bû ku ev zanîn her zindî bimînît, Her dîsan ji bo ku xwedayê xwe ji xwe razî biket di roja heşrê de ser bilind bît kitaba emelên wî hemî başî binberamber xweday.

### 2.5.5. Dîvçon û Wergirtina Zanînê

Mîna hemî xwendkar û feqî û mela û her kesî li zanîn û zanistî di gere li gelek deverên herêma Kurdistana îraqê gerîya ye, Ji bu ku xwendin û zanînê li cem xwe peyda bike, Lewra her ji zaroktîya xwede ew hînî tîpên erebî dibe û xwadina qoranê li cem babê xwe di xwîne, hê temenêwî biçuk di gere nava gundên dewru ber Şoşê, ji bu ku hînî zanist û zanînê bibe. Weke hemî zana û fqeyên dînî, Bi vanhatin û çunan mifayek baş li cem wî peyda di be û i dîf şopa bav û kalên xwe bi çît meşxela zanînê bilind bikin.

Di van geştên xwe de ewî di van deveran geryaye “Ji alî yê qezaya Suran gelek Gundên wê deverê têkvedayne û zanîna xwe jê wergirtîye weke: Helêr, Kuyê, Kurê, Rewandiz, Hîzanê, Hêlewe Sîsyawe, Bêlinge, Heta ku di gehîte(Cildanî) ye li nêzîk Şinoyê. Herdîsan li gelek gndên devara behdînan xwandîye wek: Akrê, Şoşê, Swîsina, Gundikî, Bakirmanê, Baîqalaaxay, Xwîlê, Mikêrsê, Zêwka, Kendala, Nisra, Bagêra.”(Hemze Tahir Şoşî,2012;29-30).

Şêx Tahir behsa çuna xwe di ke dema ku li zanînê di gerya demaku di bêjît:"li sala 1354 mişextî hevberî sala1935-1936zayînî, ez çume akrê li nik mela muhemed yê pêşnivîj û li wir ez vegeryam Şoşê min linik mela şemsedînî pênc mehan xwand di duvde ez şume ez çume gundê nesra linava berwarî jêrya, li sala (1355 )Beramberî sala 1936-1937z, min pirtûka (Tesrîf Mela Elî)di serfê de di gel pirtûka (Elwedi`) û (El istîare) li nik Mela Ahmed Hostanî li gundê Nesra xwand, Paşan min dest bi xwendina pirtûka (Elcami) di honera rêzmanê de kir, Paşan bi pîyan ez vegeryan nav gundên duskîyan li bagêra min li ni seydayê mela huseyîn marunisî dû mehan li cem wî min xwend çi nemabû ku ji birsande bimirim jiber hejarî dest kurtîya gundî lewra ez vegeram mal li Şoşî" (Sadîq Bihaedîn Amêdî, 1980; 511).

Divan geştên xwe de bidehan pirtûk û namîlke xwandîne ji yên bisanehî bû yênbi zehmet wek: ecromî, elezî tesrîf mela Alî, şerih el şafye di ilmê serfê de, enwar, gulistan, Elewamil, elzirof, sedillah elsîr, şerih elmexnî, elîzhar, elefîye di îlmê neho de, elwedih, elîstiare, elcamî, fetih elqerîb, metin elmenhac, şerih feraid elmenhec, tehfe elmhtac fî şerih elmenhac. Di ilmê feqhê de, her wesa eysaxocî, (Hemze Tahir Şoşî, 2012; 30).disan gelek pirtûkên din xwandne ku bi şêweyê ders û ji bû berkirin, û pitirîyan van pirtûkan bi xetê xweyê ciwan nvîsandine ta niha li cem kurê wî di parastîne.

"Li sala 1375k beramber sala 1955-1956z xoday wesa vîya li ser wan kul û keser û nexweşîya ew tuş bû yê ku eşek giran, neçar di mînît li newexşxaneykê di mînît li Mosilê  çwar mehan û bîst rojan li nexweşxane yêdi mîne"(Hemze Tahir Şoşî, 1987; 18-19). Di van salan de ne xweş dikeve lê hizra wî her li ser xwendin û zanistê di mîne lewra dema ku ji nexweş xaneyê der dikeve ve di gere akrê li wir gelek bizav û xebatê dike ku careke din rabe ser xwe lewra daxaz ji yezdanî dike dawaza harîkarîyê jê dike dema ku di bîjît:

"***Yareb tubidey ji kenzê îhsan***

***Ronahî bi dil beyanê ezman***

***Ezmanî ji min bikey senc***

***Da bînme derê li dil hizar genc***

Herweha li cihek din gotî ye:

***Ger yar bî Xudê û ez bimînim***

***Dê rişte (Rîyadê Nor) vehînim***"(Hemze Tahir, 1987;19).

Ew bi awayek ji dil vê hozanê di vehîne ji bo ju heta ew di jîyanê de mabe her b xebite û xizmeta zanist û dîn bike, lewra lava ji yezdanî dike ku ew xizmeta wî bike bi nivîsandina pirtûka riyadê nor.

"Li sala 1376k beramber 1956-1957z li ser meha remezana pîroz berpê xwe dît û şîya wexer ket te vê derya bê bin û dest bi vehandin û nivîsîna wê rîsê jêre ji van biket. Ev pirtûke wesa dihat berçavan ku bibît gencek û pêngaveka di rlêj bi havêt di di deqa ture û nivîsînê de. şîya dest pê biket û jîn û mêjoya pêxemberî vehînît û dinav ciwantirîn mêrgên kulîlka de danît û xweştirîn peêyv wêje bo danît û bi rêk û pêk bi golan bi xemlînît." (Sadiq Bihaedîn Amêdî, 1980, 515)

Di serê dest pêkêka pirtûkê de weha di bê je:

***Gava me serê kîtabê danî***

***Mahê remezan bû xoş li canî***

***Hedtê şeş û hizaro sê sed***

***Bû hîcretê yarê mey(Muhemed)***. (Hemze Tahir Şoşî 1987;19-20).

Di vir de soz di de û lava ji yezdanî dike ku dema ku ew sax bibe ewê pirtûka Rîyadê Nor vehîne û bi awayek ciwan û nazik ewê têde wesfa pêxember biket, lewra dema ku dest bi nvîsana wê pirtûkê di ke di meha remezanê de bû ye ku heyvek proze jiber wê yekê bi şêweyê hozan pesin dike. Anku tê beramber sala hicretê ku di hozanê de behis kirîye.

Di wê sala dest nîşan kirî de xweya dibe ku di meha remezana pîroz de dest bi wê pirtûkê kirîye ku (Ryadê Nor)e, Di meha remzana pêroz de, Şoşî gelek bi nvîsandina wê ve di weste û mandî bon pêve xweya dike heta sê pşkên şevê wî di nvîsî çi li ber lempe yan anus yan çirayên weke mom tê bikar anînîn ji bu şevê yan gelek şevan li ber tîşka hevê, taku ev berhema ciwan û pir biha pêk înaye.

### 2.5.6. Mamosta û Seydayên Wî

Her di kevin de milletê Kurd xwedî zana u seydayên mezin bû ye nexasme li devera behdînan çendîn zana û seydayên hîja li nav de rabûne, kewate Kurdistan her ji kevinde cihê vehewandin akincî bûnê ye, Li hemî gund û bajrên li hocreyên mizgeftan feqî û mela û zana li wan deran ava bûne, ne xasme devara Akrê amêdî gelek deverên din yên behdînan, ji bû ku meramên xwandin û belv kirinê qesta mizgeftên wan devar kirye, Li van mizgeftan seydayên bi nav û deng lê jîyayne bi gotna dersan ev mizgefte saxkirîne, Şêx Tahir jî yek jiwan feqîyan bû ye sera gelek seydayan daye ji bû ku pitir zanin û zanistî wergirît.

Emê hind ji seydayên wî bi din ber çav ku xwandin li cem wan xwandîye,“(Şêx Memduhê Kurê Abdulwehabê Şoşî)li Şoşê û herwesa (Mela Mihemed Akrey)liakrê û (Mela pîrê kadanî)Li başqala axay herwesa (Mela Şemsedînê Kurê Yunisî Şoşî)li Celdîyanê û (Mela Ahmedê Hostanî)ligundê mikêrsê (Mela Husênê Maronisî)li gundê bagêra û (Mela Omer Kurê Seydê Surçî)li mizgefta avdel axay li akrê herwesa li cem (Musftî efendî )her li akrê xwanîye”(Hemze Tahir Şoşî, 2012; 31). Li cem van hemu zana û melayan xwandîye ji bû ku zanîn û zanist li cem zê de bi be bi awayekî bi xem xwendîye zanîn li cem xwe peyda kirye.

“Her weha qesta devera suran kirîye li cem seydayê berkeftî xwandîye wek(mela abdulazîz kurê kak mustefay) Li gundê hîzanê û (Mela Tahayê Kurî) li gundê kurî ûbatasê û (Mela Abdulmecîdê Hertelî) li gundê bêlinge û (Mela Salihî Kuze Pankî) li xaneqa şêx mezherî û (Mela Mehsomê kuyî)li şarê kuyê xwandîye, dîsan li ba (mela adbullayê kurê mela muhemmed amînê bêtwatey)li mizgefta hacî abdulqadirê debbax li bajrî Hewlêrê.”(Hemze Tahir Şoşî, 2012; 31).

Xwendekar û zanayek bi xem boye lewra di nav wan nexweşyan de û barê jîyanê de li çend navçeyan gerîya û li cem van hemu seyda û zanyan xwend ji bû ku pê geha xwe ya zanistî mukum bike.

"Li sala 1947-1948z çuye gundê (Susinan) Li Hewlêrê destîr nameya zanistî ji destê seydayê camêr mela abdullayê bêtway wergirt"(Sadiq Bihaedîn Amêdî,1980;514). Pirî van hemî hewli û mandî bonê di zivrît gundê Sîsina li Akrê weke îmam û xetîb di bîte cihê rêz û hurmeta xelkê deverê.

"Her dîsan seydayekê din ku gelek kesek zana bû ye Şoşî gelek hej ji wî seyday dikir çunkî ew di alîyê dîn û Ilmî de mirovek herî zana bû ye. Belê birêka nameyan gelek demê xwe bi nvîsîn û belafkirina nameyên wî terxan kirî Xudê jê razî Mela Se'îdê Nûrsî ye, Ku Mamosta û serkêşê(Telebet Elnor) ewên li welatê turkîya di ber belav ku nabirî buye êk ji qotabîyên nursî".(Tahsîn Îbtrahîm Duskî, 2000, 144)

"Digel ku Şoşî Bedîuzzeman Mela Se'îdê Nûrsî 1960 rûbirû nedîtîye jî piştî ku di sala 1928/1929an de berhemên wî xwendine ew jî ji xwe re wek seydayekî qebûl kirîye û dema Gulzar nivîsîye di muqeddîmeyê de bi taybetî pesnê wî daye:

***Ya reb tu min û xuamê Qur'an***

***Seydayê mezin melayê Kurdan***

***Seydayê heman Se'îdê meşhûr***

***Ustadê me cumle talibê nûr***

***Çil salî me ew pitir li heştê***

***Ya Reb me heman bibey biheştê"***(Abduurahman Adak, 2020,1510)

### 2.5.7. Feqî û Xwendkarên Li Ber Destê Wî Xwandî:

Navê Şoşî her di feqetîya xwe de bi zîrekî û çakî û başî û zanatî belav boye, Lewra piştî vegeryay gundê (Sîsina)Li rojavayê Akrê akincî bo jinber wê yekê gelek ji xwendkaran qesta wî kirî ye ji bo ku hînî xwendinê bibin mifa ji xwendina Şoşî li van

deverên xwednî bibînin, Ji ber ku ew maweyek dirêj bû ku Şoşî çuye çendîn deveran û gund û bajaran gerya ji b ku îlm û zanistê li cem xwe peyda bike, Gelek ji wan feqeyan niha disaxin behsa qencî û medhekarên wîne duyan jibo wî diken.

### 2.5.8. Feqeyên Wî

3. Şêx Muhemedê Mêrsîdî: Li sala (1936z) ji daîyk bû ye, qesta Şoşî kirye li sala (1954z) û kitêba (Elcamî)di nehwe ya erebîyê de û ktêba (Elminhac) di fiqhê Şafiî de li cem xwandîye, Bû dema 30salan bûye îmam û xetîbê şarê (Başîkê), heyamekê li şarê (musil)akincî bû ye, Nuke li şaroçkeya(Kelekê) akincî ye.(Tahsîn Îbtrahîm Duskî, 2000, 146).

2- Şêx Abdullrahman Kurê Muhemed Elî Pîr Çawişî: Li ber destê şêxî (Niho)û(Serif)û(Feqhe) xwandî ye, Li sala (2009) wefat bû ye û li gundê wî veşartîye.

3-Mela Silêman Elî Berdereşî: dîsan (Niho) û (Serif) û (Feqhe) Li cem xwandî ye, Bû ye êîmamê gndê (Zengenan) û (Berdereş) û (Mem û Zîna) ji mêje wefat bû ye ûli şarê (Berdreş) veşartîye.

4-Mela Abdulhakîm kurê Cesîmê Mizîrî Jorî: Dîsan (Niho) û (Serif) û (Feqhe) li nik xwandî ye, Boye îmamê gundê (Zêwka Fexrî), Li (20/12/2009z) wefat boye li şaroçkê (Behirkê) sipatîye rehma xwedê.

5-Mela Abdullrehmanê Mîr Sedrîyê Herkî: (Niho) û (Mentiq) û (Belaxe)licem wî xwandîne, Bu ye îmam û xetîb li mizgefta serok barzanî li(Pîrmam), Nuke keftyê nivînaye û bê çareye, jîyê wî di nêzîkî heştê salîyê de di çît.

6-Mela Xalidê Cêbirî: pêk ve di gel Şêx Muhemedê Mir Sîdî (Camî ) û (Menhac)li def xwandî ye, Nuke li Kumelgeha Tenahî ye li rojavayê Duhokê.

7-Şêx Islam kurê Mela Muhemedê Şoşî: birayê Şêx Tahirî, Dersên xwe li bal birayê xweyê mezin xwandîne li gundê (Sîsina), wefat bo ye li (12/8/1995z)û li şarê (Mîsil) veşartî ye.

8-Mela Muhemed Emînê Zêbarî: Dîsa ders li ber destê (Şoşî ) xwandî ye li gundê (Sîsina), Di bît nuke akincî yê şarê musil bît.

9-Mela Husênê Gîzî.

10-Mela Salihê Kurê Keremê Govey: Di esil de ji gundê (Zînava Mîrî )ye, Li cem Şoşî xwe hînî rênemayên xet xweşî yê kirî ye, Hatîye girtin û kuştin bi dest rjêma behsa dorinde demê hewagirtina wan li (Qoştepe)lijêrîya Hewlêrê û(Behirkê)li rojavayê dest pêkirî li (31/7/1983), Nêzîkî heşt hezar barzanîyan ji nivşê nêr hatine girtin û ta niha jî di bê seru şînin.

11-Mela Abdulmuxesê kurê Xelfeyê Duberdanî: Imam û xetîbê gundê (KaîLan ) bo li jêrîya şarê berdereşê.

12-Şêx Hesen Kurê Cemîlê Etrîşî: Li ba Şoşî xwe fêrî meşq û xet xweşîyê kirye li gundê (Sîsina).

13-Mela Şakirê Taqîyê Akrey: Ser meşiq bo çêkirîne xwe fêrî xetî kirye.

14-Mela Ibrahîmê Gorgavay Zêbarî.

15-Seyîd Abdulqeharê Barzanî.

16- Mela Sabirê Kurê Kamilê Xêlekîyan.

17-Mela salihê kurê Mehmîdê Barzanî yê nasyare bi(Salihê hîtê).

18-Mela Sadiqê Mizîrî Jorî: Helgirê bawernameya masterê ye, Li demekê dirêj li şarê musil îmam û xetîbê camîa (Kefaat), Tuşî renc û zîndankirina rjêma behis bo ye, Li dîf de neçar bo ye li welatê(Qeter)akincî bibît ta noke.

19-Feq Ahmed kurê Mela Hemîdê Şoşî: Li mizgefta gundê Şoşê bangevan bo ye, Li rêka mizgeftê bo nvêja spêdê tê kuştin.

Ev hemî  zanîyarî piranîyan wan li cem kurê wî Hemze Şoşî û xêzana wî ku heya niha di jîyanê de maye dane xweya kir. Ji berku Şêx kesek xemxor bûye lewar di

piranîya cihan de gereyaye ji bo ku xwendin û zanînê li cemm xwe peyda biket, her dîsan çendîn gund û bajar hocreyan geryaye mîna bajrêhewlêr û musil û duhok û qeza akrê amêdî yê nahyeyên bamernê, Çendîn cihên din heya ku zanîn û zanistê li cem xwe peyda biket, lewra gehişte vê qonaxê da ku xwe di biindahîya edebîyata kilasîkîya kurdî de bi bînît, kewate Kurdistan her ji kevinde cihê vehewandin akincî bûnê ye, Li hemî gund û bajrên li hocreyên mizgeftan feqî û mela û zana li wan deran ava bûne lê heya gehiîye vê qonaxê û çendîn nexweşî û zehmet dîtin di wî serdemî dene xasime li gundek mîna Şoşê heya niha jî şonewarên wan cihan di dîyar û aşkrane, Eger nexweîşya şoşî lê neba ewî bi hemî hesa xwe kar dikir ku pitir berhem hebin û pêtir xwe bi westîne bedewamî bide rêbaza xwendin û zanînê.

### 2.5.9. Nexweşî û Mirina Wî

Di dumahîya herî dawîde em hemu dê ji vê cîhanê barkin û ber bi cîhana rasteqîne ya ku xweday afrandî çîn, Lê ew mirov wê bi serkeve ewê ku ji bu axretê kar biket li wir serferaz serbilind bît, Şoşî jî gelek zehmetî û nexweşî dîtin lê ewî jîyê xwe hemî bi zanist û zanîn dîn perwerî ve eda kir ji bo ku li roja dawîyê de li roja heşrê şermezrî xwedayê xwe nabît, Ji ber wê yekê ew di dunyayê de hebalînya çakan zanayan dikir da ku li dunya û axretê serferaz bît, Gelek hesdikir ku bimîne sax lê jiber ku êşa wî ya giran lê bibo bela û heskirina xweday hate serxwedê emanetêxwe jê distîne ji vê cîhanê bar diket.

“Xudê jê razî li dumahîka jîna xwe tuşî nexweşîyek dum dirêj û giran bûye û ji hêz û vejenê êxistye demêheşt sala di nexweşxanyan û diktiran geryay li bajarê musil û bexdayê û gelek demê xwe li nexweşxaneya (Twîset) I jêîya bexda may, neşîyaye omêda xwe bicî biket û jîyananmeya pêxemberî (Silavên Xwedê Lê bin )xirê bi Kurdî biket şiîr, Liser vê êşa wêran û mal xirab xwe teslîmî êşa xwe nekerîye pitir û vejenîye û karye kêmekê ji omêda xwe vehînît û ta sala (Pêncê kuçî)van rodanan tumar biket, belê bi sedema wê nexweşî yê çavêt xwe niqandîne û xatra xwe ji vê cihanê xwastîye li roja (Eynî) li rêkeftî: (12/12/1962), Li roja paştir sindrîka wî ya pak û bijwîn veguaste gundê Şoşê û li goristana Şêx Şemsedînê Şoşî sipartîye rehma xwedê.”(Hemze Tahir Şoşî,2012, 98).

“Şoşî divîya nemirît daku bi şêt pitir ji jîrê xwe di xizmeta nivîsînê de xeriç biket û tiştên nwî ji bo tuxmên bihêt anku nivşênbihêt tumar biket belê hezkirina xweday liser hemî vîyana ye demê êşa mal xirap çav lê tarî kirî birye ber rehma xwedê bexşinde ji çil û pênc salîyî de li roja înî 17 recebê sala 1381kuçî beramber 12 kanona êkê sala 1962z li bajarê akrê, laşê wîyî pak li goristana Şêx Şemsedînê Şoşî veşart” (Hemze Tahir Şoşî,1987; 26).

Hizar silav liser gîyanê wî yê pak bin û hîvî darîn ji yezdanê mezin di rehma xwe werket, û hejî hevalînîya çak û ewlîya û peyambera bît û cihê wî bikete biheşta xwe.

Li vir Şoşî pir omêde ji her kesê berhemê wî di xwînît hîya wî bi cih bînît û dewlet serê xwe dua û fatîheyekê jêre bi xwînît demê di bîjît:

***Min hîvîye ey bira û yaran hûn bîrve neken me car bi caran***

***Ez maîy tenê sikut di qebrî paşmayê meye feçengê hobrî***

***Çengek me hobir dinav qelem kir şirîn me ryadê nor reqem kir***

***Belkî bo sebe duayê çakan heşra me biket xwedê li pakan***

1- Li vir ji bo me eşkere dibe ewa Şoşî tumar kirî zêdey salên jîyê wî ye eger berawirdeka jîyê wî bikeyîn ku bi tenê (45) sal borandîne, şîyaye di van salên kêm de berhemek zêde li paş xwe bihî lît û navê xwe bilind tumar biket digel texa zanayên aîynî, ku şareza boye di hemî zanînên xweve, dîsan wek nivîser û dahê nerê hozanvan û mêjovan û başnivîs û rexnegir û çaksazê civakê û şîret van di hête hijmartin.

2- “Şoşî di gelek babetên xwe de raboye bi ravekirin û rohnîkirina hindek peyvan û zaravên zehmet di dîwanê de ew jî pişt bestin li ser rewşenbîrya wî ya berfireh û li ser hindek qamosên zimanî hidek caran em di bînîn nivîsîn di nava çavkanîyan de(nîşana pisyarê li vêrê rapurtîye) yan(paşbenda zarvekirî )yan(hosa ya hatîye Şîar kirin herwekî di qamosê de) ji bilî wan ew hindek caran di hête nîyasîn bi nîşan û bajaran”..(Tehsin Duski, 2000;14).

Şoşî, di dewrê xwe de li gel gelek aliman têkildar e ku ew bi name û bi hevdîtin û Û bi hatinçûyina xwe ji derdûrê xwe dide hîs kirin. Wek mînak bi nameyekê bi Se'îdê Norsî re têkildar e. Bi helqeya ders û feqeyan ve û bi seydayan ve û bikesên rewşwnbîr ve jî têkildar e. Herwiha ji ber ku jîyana wî di nav refên kitêb û helbestan de derbas dibe, di eynî wextî de bi hozanvan û stranbêjan ve jî têkildar e. Ew rewş, bere wî dide bal edebiyat û dîwanên Kurdî.

"Şoşî dest nîşan kirin di pêşya gotina xwede di dîwana demê cizîrî dîyar kir ku ew çav lêkerê feqê teyrane li sala (1031m) pişt bestin û ser sêkê ya tumarkirî(Siclî)têde hatî ye sal ser zimanê teyran û bo vê çi dem dîyar neboyne dîyar nekirine. Şoşî di bîte yekem vekuler dest nîşan diket di cizîrî û teyran de di wî demî de demê ku nakukîya dijwar hey di navbera xwandevana û jîyan nama hozanvanên dîyar kirî".(Tehsin Duskî, 2000;145).

Dema ku zimanê Kurdî pêk di hêt liser hndek dengan ku zimanê erebî de hebona wan tune ye û ji bo wan dîyar nebît pîtên berçav ji alîyê daneyan ve û arezû mendîyek ji Şoşî ji bo rêgirîkirina dîwanê, Şoşî raboye bi hebijartina nîşan û hêmayan ku kesê di berî weî de yek nekirîye dê bînîn wan wêneyên paşband di vê gotarê de zêdebarî hêmayên dest nşankirî ji bo rêgrîkirina hozanê ji alîyê panyatîve welke bêdeng kirina bizwênan yan bizwên kirina bêdengî yê ji bo sengê, ev yek dibe arîşe beramberî me ji bo nivîsan dina hozana kiasîk di hête dîyar kirin ku rêka nivîsandina Kurdî ya bernîyas evr li cem me peyda bo ye dema ku Şoşî nivîsî di dîwana xwe de ew yê zana bo belê pişt dayê di evê yekê de di bêjît:(ewa vê gavê hindek nivîserên Kurd kirye nerîtek bo wêne kirina -haê-ji yên vekirî -ya- û -waw- bo oyê tak û di îva peyvê de bît û di peyvên erebî de ew sistyeke di daxwazê de û şêlîkirina ser xwandevanî û gotineka kêm hizrîya Kurdan). (Tehsin Duskî, 2000;148).

Xweya di be li vir Şoşî hemû deman xwestîye dema xwe bi nivîsan û xemxorîya ziman û hozana Kurdî bike stuyî xwe weke vejanekê li ba wî bi bi hê nirxandin û herdem ev hozan û edebîyat û nizîsandnên wî zindî bimîninn. Ne xasime hozana kilsak ku tesîrek mezin li bal melayê cizîrîve lê hati bo kirin ..

## 2.6. Dahênan di Hoznên Şoşî de

### 2.6.1. Şoşîyê Hozanvan Dahênan û Honermendîya Wî di Hozanê de

Şoşî weke her zanyên din dstek bala di vehandina hozanan de hebo ye zîrekî û şîyanên baş di vehandina hozanan de he bo nexasme hozana Kurdî, Herwesa dahênan û nîyatî dihozana Kurdîde kirye.

Gelek ji zana û hzanvan û xwendkar û nivskar ji binemala wî de peyda bone ji wan hozanvanan wek:(Xerîb)ku navê wî (muhemed xerîbe)e ew di bîte xelkê gundê Şoşê, dîsan hozanvan (Seyfî)ku navê wî (Abdulletif kurê Şêx yonisê Şoşî)ye,berehmên li ber çavin û bi hêzin.(Hemze Tahir Şoşî, 2012; 42).

Şoşî rolek giring di vehandina hozana Kurdî de hebo ye, Dema ku şîyay di heşt salên vehandina dîmahîya jîyana xwe ewên tê de nexweş ketibu. Ku hozanên xwe bi zimanên Kurdî erebî farisîvehînît, belê ya ji hemoyan mezintir ku Şîyaye jîyan nameya pêxemberî (Silavên Xwedê li ser bin) mîjoya musilmanetîyê yê ta sala pêncê kuçî hemî bi şiîr ve vehînît û nav lê dana ye (Rîyadê Nûr), belê li gelek cihan de dîyar kirîye ku navê wê bi Kurdî (Gulzar)e dem ku di bêjît:

***Ger çî me li nik xeyalê dore***

***lakîn-çemen û rîyadê nûre***

***Serhatîyê wî resolê muxtar***

***hem nor û çiraye hem xu Gulzar*** (Abduurahman Adak, 2020,1513)

Divan dêrên honaê de wesfa wê yekê dike ku ew pirtûka ewî nivîsandî li ser resolê xwedê navê wê kirye rîyadê nor ewa bi kuedî jê re gotîye gulzar.

“Dîsan di derheqî hozanvanê mezin (Mela Ehmedê Cizîrî)rawestaye û pênc hozanên wî texmîs kirîne bu nimne di bêjît:

***Yara bi fîraqa te ji dil teng nefesim ez***

***Xemgîn û keser dar û we bê dadresim ez***

***Her çendî di kuşim kebeda min bi resimez***

***Cana ji cemala te muqdes qebesim ez***

***Ger horû perîzade nezerek te besim ez***"(Hemze Tahir Şoşî,2012, 42).

pitir hêz û dahênana Şoşî eşkera di bît dema ciwantrîn û bi hêztirîn hozan raçandî li ser şêwê gulekê ku karîye pênc şêwên honerî têda bi kar bînît ku me nedîtîye ta niho hozanvanek bi vî karî rabibîtin li serî di bîjît:

***Li moma dilê min taze şoxlek welê hilbo***

***Yuwecid elyem mîn hebîb micmel***

Li dîmahîyê jî di bêje:

***Li cenet rehîqa weslê tahir vexor yek cem***

***Amanû teslîm lirac û muemil***"(HemzeTahir Şoşî, 2012, 42).

Di vir de eşkere dibe ku hozanvan Şoşî yek ji mezintirîn hozanvanên kilasîkên Kurdî ye, dîsan di gelwan hozanvanan di hêt ewên jimara malkên raçandî ji yazde hizara pitirin, hêjay gotinê ye hozanvanî hozna xwe bi Sê zimanan: Kurdî erebî farisî vehandî ye, hemî jî bi awayek sehil û sanehî ji bu ku xwendevan tê bihe.

Şoşî şîyae navê xwe bilind bi helawîsît di hemî bîyavên zanistî de ku hêjay hin dê ne em bi çavek mezin lê binrin. Lewra ev texe di hejîne ji bo ku rêz û îhtiram lê bihê girtin navên wan beriz biên nirxan din.

"Em di karîn bi bêjîn Şoşî boye mêvanê (Mela Ahmedê Xanî)li dîwana wî runiştîte dema ku hoznan Gulzarê bi pend û Şîret liser kêşe û selîqeya (Mem û Zînê)vehadî ye"(Selefî, Duskî, 1993;170). "Hozanvanê mezin mezin nela ahmed kurê îlyasî kurê îyazî yê xanî, peydabo ye li gundê bayezîdê xanî li sala (1961k/1651z)dest bi xwandna xwe feqayatîtê kirîye. Li gundê bayezîdê paşan qesta orfa ûxelat û bidlîsê û

cizîrê badînan kirye, li botan îcaza ilmî wergirtî ye, Nav û denge bi dîwana mem û zîn û nu biharê, wefat bo ye li sala (1119k/1706z)" (Tehsîn Îbrahim Duskî, 2007; 13).

### 2.6.2. Dahênana Hunerî

Hemû deman şêxî hizir di nwîyatî û dahênan de di kir ku berdewam ciwaz be ji hemû kesî, le wra hemû hewil di dan ji bo ku ew bi be dest pêş xer di nwîyatîyê de ji bû ku edebyata Kurdî herdem zengên bimne. Ji ber vê çendê di xebitî bê rawestan û dema xwe hemî terxand dikir ji bû xwendin û nivîsan û dîyanetê de ji bo ku xwedayê xwe ji xwe razî biket.

"Karê yekem ku livir behis bikin û bi din ber çav hoznak Şoşî raçandîye li dumahîya dîwna melayê cizîrî ewa wî pêdaçun kirî û bi xetê xwe yê ciwan nexşandî û teslîmî xwedîyê çapxana Kurdistan (Mukiryanî kirî)ji bu çapê, lê belê ev daneye berzebuye û hatîye sutin" (Abulhamîd Alî, 1977: 927).

"Dane yek din Şoşî pêda çun nek ji dîwanê kirye biber wê daneyek nivîsî bi hemî îşaret û zarav û rênmayên Şoşî li nav danay".(Mihsin Duskî,1989;73)

"Herwesa dema tehsîn duskî dîwana cizîrî belav kirî mifayek baş ji vê daneyê wergirt ewa Şoşî pêdaçun û tehqîq li ser kirî bi navê kuvilî daye nîyasîn lê kuvilî bi eşkera navê Şoşî li ser înaye"(Tehsên Îbrahîm Duskî, 2011; 13).

Dinava dîwnacizîrî de mifayek ew qas baş hate dîtin ji alîyê şêxîve ji bona ku ew bi xwaze minak li cem hebin ji bo ku ew berdewam bi xebite ji bo xwendin û nivîsan din û dahênan di hzanê de her wesa di nivîsandinê de.

"Ev hozane li ser dîmenê guleka (Deh) pel hatîye nexşan din gelek xalên pir seyîr û serinc rakêş li nav de danayne ku bi zimanê erebî di bê jinê (Elbedîat)" .(Elhaşimî,1960;73).

**Wêne. 1: Mûma Dilî**



Ev hozane biawayek balkêş hatîye nivîsîn bi destxetekî ciwan û balkêş hatîye nexşandin ku bi vî awayî di de xweya kirin mîna gulekê ye di evejî ew royên seyîr û bi dahênan tên hejmartin di vê hozana bi navê (Moma Dilî).bi nawazek ciwan û serinc rakêş ev hozane şirovekirye û endazeya wê bi şêwek seric rakêş daye xweya kirin, ev wêneye bi guleka deh malkî hatîe nexşandin, her malkeka gulê raçandîye bi destpêk û dumîka wê hemu pêkve girê dane, Anku lidemê xwandevan di xwîne bi şêwê stun di bîtît di xwînît honerê ciwan jê dwîr dikevît.kêşa vê hozanê li beramber kêşa hozan erebî dikevît ku kêm hozanvanê kurd ev kêşe ´eroza ´erebî nivîsî ye. Du herfên dumahîya hozanê parçeya kurdî dubre dibin despêk bo parça din ya ´erebî. Hozan di bêje:

***Li moma dilê min taze şoxlek welê hilbo***

***Yuwecid elyem mîn hebîb micmel***(Hamze Şoşî, 217;6).

li dîmahîyê jî di bêje:

***Li cenet rehîqa weslê tahir vexor yek cem***

***Amanû teslîm lirac û muemil*** (HemzeTahir Şoşî, 2012, 42).

Ev hozane bi wayek zor ciwan û balkêş weke guleke deh malkî hatîye nexşan din, Her malkek wek belgekê gulê hatîye raçan dî ye, destpêk û dumahîka hemî malka pêkve grêdaye, Anku li demê xwandina wê pêtivî ye mirov li dor hozanê bi zivrît, ke wate ciwanîya hozanê di dîmen û nexşê gulê de ye. Ji berku dema tê nivîsandin bi şêwê situnî tê nivîsandin tama xwe nadet û ew honerê ciwan jê dwîr di kevît.

### 2.6.3. Hozana Mêjoyî

Dîsan şarezaya wî di hozanê de xweya di be demê vehan dina dîruka musilmanetî yê û jîyana Pêxemberî (Silavên Xwedê Lê Bin) rabu ye, heta sala pêncê kuçî ji berku êşa wî bi hêztir bo ye ku bikarît vî babetî temam bi ket. Ev pirtûke bi zaraveyê kurmancî ya jorî ve handî ye kumalkên wê gehiştîne sêzde hizar malka(Hemze Şoşî, 2017:11).

Lewra ji bu vê sefera dirêj karê xwe dikir ji bo ku vê dîrukê hemî bi şiir vehînît, bo vê mebestê dibêjît:

***Ey dil kesera teya li mê je***

***Were wek te divê bi Kurdî bêje***

***Mewzonê kelam gelek şrîne hem***

***Dilvekere hem xemrevîne*** (Hemze Tahir Şoşî, 2012;73).

Mebesta wî eve ye dema di bê jît:

***Min fikre bira ku ez bi bêjim daxa dilê xo ez bi rê jim***

***Jîn û esera wî dê vexwînim*** ***dê taze bi şiir û çak vehînim***

***Behsê wî di ken biher zimanan*** ***medha wî dken li her mekanan***

***Ema me heta niho nedî te*** ***jîna wî bi Kurdî şrîne*** (Hemze Tahir Şoşî, 2012; 73).

### 2.6.4. Hozana Şîret û Nesîhetan

Xwedê jê razî bi qelemê xwe xizmeta ayînê pîrozê îslamê de terxan kir ye, beşekê hozana xwearastey civakê xwe kirî ye ku mrovê musilman lazime yê çak û xêrdar û rehet bît di hemî karên xwe de, li duf şupa pêxember biçe û wî bi kin destur ji bo ku jîneka aram û berfireh û xweş bi bin serî bextewer bi jîn.

Ev namîlke pitir ji hizar malkan pêk hatî ye, Lipêşya wê di bê je:

"***Ey nazirê ev riyadê nore***

***Min ser te bra selamê zore***

***Nushek jite ra di bêm bi çakî***

***Guhdê re ji min qelbê pakî***

***Hulçîneke min ji bax bijarî***

***Ez bu te di bêm di rahê barî***

***Guhdêre bi ciwan û pêbikey kar***

***Dê her du cîhan bi bî xodan bar***

***Ekser ji hedîs û ayetin ew***

***Yan qewlê xodan dîrayetin ew***"**(**Hemze Şoşî,2017;28**).**

"Şoşî bi awyek ciwan şîret kirî ye ku mirov mifa û eqil û serboran jê wergire. Her çende Şoşî ev name kirye paşgoyek bo gulzarê belê hate pêşinyaz kirin ev çenda belav kirî di gulzara xwe de di gel namîlkek wîberhev kirî bi navê (şîreta biray) ev name li sala 1987z hatîye çap kirin binavê"(Tahir Şoşî 1997,18).

Ev nama şîretan ji gelek babetên ayînî û civakî pêkhatî ye ku mirov ser boran jê bistîne wek: pena ji bo xwedê, sipasî xwedê, vîyana pêxemberî û hevalên wî, rewşa musilmannetî ya evro, nivîsîn û zanîn û xwe fêr kirin, zekat û rîba, sebir û aramî, ramana

sebrê, jin xwastin, hevalînî, rênvberî, mal û diravê helal, abor û îsraf, qelsî û merdînî, zulim ê sitem, berhengar stemkara, yekbun û tifaq, meşoret, sêr bendî hesîdî, û gelekên din (Tahir Şoşî,1997;19).

### 2.6.5. Paşmay û Destkarîyên Honerî û Endazey


Ew di jîyana xwe de rastî gelek karan bo ye vîyana wî bo her karekê nifa tê de bît xwe hînî wî karî biket, Çunkî her delîveka di hêt morov pê dawîstîyên xwe biwî karî dike.

